

Hevalên hêja,

amadevan û beşdarvanên vê roja xemgîn-wefata kekê me yê nemir Kerîmê Husamî,

Têkoşerekî bêhempa, nivîskar û rojnamevanekî berz, welatparêkî navdar ê Kurd, hevalê me hemûyan Kekê Kerîm ji nav me bar kir. Ew çira ya ku ji nîv çerxî zêdetir di nav tevger û doza Kurd de her ronahî da, vemirt. Ew pêûsa ku bi dehên salan, law û keçên welatê Kurdan, li ser doz û têkoşîna wan agahdar kirî, ew bi doza welatên wan re nêzîktir kirî, nenivîse. Ew zanayê ku em li ser gelek pirs-gîrekên neteweyî-dîrok û têkoşîna kurdewarî ronî kirî, ne di nav me de be.

Em wî dengê, Kekê Kerîm li ser mîkrofonên radyonên Kurdî nebihîsin, bi awayek zindî rûyê wî yê bi ken li ser ekranên telewîzyonên Kurdî hew bibînin. Di semîner, panel û şahiyên Kurd de, hew leqay wî werin. Em ji vê bexteweriyê bêpar man.

Wefata Kekê Kerîmê Husamî, dilê hemû Kurdan-ji Hewlêr heta Diyarbêkrê, ji Qamişlo heta Mahabadê, tevayîya welatparêzên Kurdistanê, hemû rêxistin û sazûmanên Kurdistanê xemgîn kir.

Bizutina Kurd a neteweyî dê tu caran, xebata berferêh a Kekê Kerîm, li hemû aliyên Kurdistanê û di hemû qada tevgerê de, ku ewî ji pêncî salan zêdetir tê de cîh girt, jibîr neke. Herweha Kekê Kerîm sermayeyek berferêh ji bo tevgera Kurd hişt. Di dehên pirtukên xwe de, tecrube, agahdarî û zanayîya wî ya berz, dê rê li ber generasyonên nu yên neteweyê me veke, rêya wan ronî bike.

Li ser navê Hevkariya Hêzên Siyasî yên Kurdistanî li Swêdê-ez daxwaza sersaxiyê digî-hînim malbata Nemir Kekê Kerîm Husamî, dost û hevalên wî û tevayîya gelê Kurd.

Serê me hemûyan û yê gelê Kurd sax be...
Stokholm 2001 10 14

HEVKARIYA HÊZÊN SIYASÎ YÊN KURD Û KURDISTANÎ LI SWÊDÊ KURDISKA SAMORDNINGSKOMMITÉ I SVERIGE:

PDK-IRAQ, PARTIYA KARÊ SERBIXWE YA KURDISTANÊ, HIZBÎ GÛÎ YA KURDISTANA IRAQÊ, PDK-ÎRAN, HEVBENDIYA DEMOKRAT A KURD LI SURIYE (PDKP-S, PDK-EL PARTÎ, PHG-SURIYE, PÇK-SURIYE, PYDK-YEKÎTÎ-SURIYE), PDK-EL-PARTÎ-SURIYE, PSK, PDK-BAKUR, RSDK, PADEK, VEJÎN,